# Êdî Kurd hişyar û hişmend e

»»» R:10



# Kirameta mirov!

»»» R:2

# Pêgeha reftarên malbatên şehîdan li şoreşa Jînayê de

»»» R:3

# Serokkomarê rêjîmê, lat lûtan ji bo qedandina serhildana Jînayê bi kar tîne!

»»» R:7

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (448) 06-21-2023Buha (1000) Tûmen

# Dengê Kurdistana Îranê

Gelek caran li dîroka temenê mirovan de, hin tişt dibin remz û sembol, li dîroka miletan, yan welatan de jî hin nav yan emraz dibin parek ji dîrokê û tu caran nayên ji bîrkirin. Bi taybetî di dîroka xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd de jî hin roj, emraz, kesayetî û nav, bûne parek ji dîroka netewa me û wekî remz û sembol tên bibîranîn û bûne cihê şanaziyê û qet nayên ji bîr kirin.

Di dîroka tevgêra rizgarîxwaziya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de jî, “Radyo Dengê Kurdistana Îranê” em dikarin bibêjin ku yek ji wan remz û sembolan e ku hertim yad û vebîranînên wê cem gelê me bi bilind tên nirxandin, ku hewceye di vê nivisînê de bi kurtî amaje pê bê kirin. Piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê bi dijî rejîma dîktatora Paşayetî di sala 1357 a Rojî de, û xwe sepandina rejîma Îslamî bi rêberiya Xumeynî û dest bi serdegirtina hemî deskevtên şoreşê û ji nû ve hatina serkara dîktatoriya Axûndî û destpêkirna rewşa tepeserî, girtin, sêdare, xefeqan, qedexe kirina



heçî azadiyeke siyasî, civakî, dema ku Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, bi dîrokekî dûr û dirêj a xebatê, haydar bû ku rejîm amade nine tu maf û azadiyekî netewî û siyasî bo gelê Kurd û neteweyên din qebûl bike, wirda PDKÎ jî xebata aşkeraya xwe ragihand, rejîma Xumeynî bi êrîş û leşkerkêşî û kuştar û fitwaya cîhadê bi dijî Kurd û Kurdistanê bersiva daxwazên Kurdan dan.

Dema ku heçî emrazên ragihandinê ji bona piropagende di ber destê rejîmê de bûn wek Televîzyon, Radyo û Rojname. Hizba democrat jî she bi hewcehiya Radyoyekê kir ku bikare hem bersiva pîlan û piropagendên rejîmê bide, û hem rastiyên Kurdistanê ku wekî çepera Azadiyê hatibû naskirin û hem berxwedaniya xelkê Kurdistanê û hêza Pêşmerge li hember êrîşa hêzên rejîmê bigihîne guhê her kesî.

Lewma, roja 27ê meha Cozerdana 1359 an a rojî, bi biryara PDKÎ bi mihendisiya nemir Riza Xeyatî ku Efserekî Azerî bû û dostê Rêberê hertim zindî şehîd Dr. Qasimlo bû, Radyo Dengê Kurdistana Îranê hate damezrandin û bi peyama Dr. Qasimlo dest bikar bû.

Her gelek zû dengê vê Radyo yê gihîşte her derê Îranê û welatên derdor heya digehe Ewropa.

Her gelek zû ev Dengê han bû kite çavkaniya wergirtina zaniyariyên rast û zelal bo guhdarên wê.

Her gelek zû ev Dengê han bû cihê hitbar û bawerî û rast bêjiyê bo hemî xelkê Kurdistan û Îranê.

Her gelek zû Dengê han ê Kurdistanê pîlan û piropagendeyên rejîmê bi dijî şoreşê aşkera û pûç dikirin û xelk jê haydar dikir. Dengê Kurdistanê weke bangê 3 danê rojê xwe digihande heçî maleke Kurdistan. Dengê Kurdistanê rojane nûçeyên hemase û berxwedaniya pêşmergên qehreman digihande guhê her kesî. Dengê Kurdistanê şikestên mezin ên hêzên rejîmê, ku rejîmê ji xelkê Îranê diveşart, rojane belav dikirin. Lewma, Dengê Kurdistana Îranê, di nava dil û bawer û hiş û guhê her kesî de cih girt û xelk ji her tişt û karekê derbas dibûn ku xwe bigehin bi dema belavbûna wî dengê zelal. Dengê Kurdistanê gelek caran kevte ber êrîş û bombarana rejîmê, rejîmê dehan desgehên parazîtê terxan kirin ku bikare berahîka wî dengî bigire ku negihîje guhê evîndarên vê, lê Dengê Kurdistanê mil bi milê pêşmerge, çiya bi çiya berxwe da, 20 caran cihê xwe guherî, û ev deng li malên Kurdistanê qut nebû.


Piştî pêşkevtina teknolojiya ragihandinê û hatina meydana televîzyon û mahware û kampûtrê ku heya qasekê meydan bi radyoyan çol kir, lê aliyê kêm heta wî serdemî enformatîkê, Dengê Kurdistanê erkê xwe bi serbilindî encam da.

Hekî çi Dengê Kurdistanê îro cihê xwe daye Televîzyon û medyayên din, lê yad û bîreweriyên vê radyoyê herdem li dilê xelkê Kurdistanê de zindîne û bi bilind dinirxînin û yad û bîreweryên wê pîroz dikin û bal wan bûye parek zêrîn ji dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê me li Rojhilatê Kurdistanê.

Pîroz be 43emîn salvegera damezrandina Radyo Dengê Kurdistana Îranê.

Yad û navê damezrênerên vê hertim zindî.

# Kirameta mirov!



**N: Kerîm Perwîzî**
**W: Hesen Mukerem**

Tê gotin ku di demên kevnar ên eşîrên navçên Çola Ereban de, ku çanda îslamî jê re dibêje dema “cehaletê”, du eşîrên ereb zêdetirî li 20 salan şerê hev du kirin û bi sedan kes ji hev du kuştin û bi sedan carî agir berdan heyvan, karwan û jiyana hev du! Destpêka şerê bêdawî bi kuştina bizinekê ji eşîrekê ji aliyê xortekî ji eşîreke din ve dest pê kir!

Li gorî vê çîroka kevn a wê demê, jiyana bizinê ji 20 salên jiyana her du eşîran û bi sedan mirovên ku hev du kuştine bi qîmettir bûye! Ev çîroka kom û ramanên ku bi hezaran sal in li quncikên cuda yên cîhanê dijîn û ji bo wan jiyan û rûmeta mirovan ne girîng e, lê bi tiştên sivik ve girêdayî ne ku “mirov” di nîqaşek hêsan a du zarokan de kêmtir dike û wêraniyek li şûna xwe tîne ku bi hezaran mirovî jî ji bo wan nayê çareserkirin!

Di 14ê Hezîranê de li Behra Spî yan jî Medîtrane li beravên Yûnanê gemiyeke masîgiran binav bû û bi sedan kesên tê de jiyana xwe ji dest dan.

Li gor gotina berdevkên polîsan, ji sedan kesan tenê termê 80 kesan hatiye dîtin û nêzîkî 100 kes jî bi saxî hatine rizgarkirin.

Di nav amarên qurbaniyan de dibêjin ku nêzî 35 kes ji wan xelkê Rojavayê Kurdistanê bûne û heta niha termê hejmarek ji wan ku hinek xelkê Kobanî ne hatine dîtin.

Li gorî xizmekî wan kesên ku termê wan winda bûne, heta niha termên 34 kesên ji Der’a Sûriyê hatine dîtin!

Kobanî bajarê Rojavayê Kurdistanê bû ku berxwedan û dîroka wê ya nedîtî, yekem car efsaneya hovîtiya DAİŞê anî ser çokan!

Der’aş bajarê Sûriyê li herêma ereban bû ku dergehê serhildana Sûriyê bû!
Lê, çîroka bêmerhemetiya siyaset û berjewendiyên navdewletî bû sedem ku lehengên şerê li dijî DAİŞê û deriyê serhildana li dijî rejîma hov li Şamê, bo kar serî li Lîbyayê bidin û ji wir jî jiyana xwe bibînin. Paşeroj li gemiya qederê siwar bû û li beravên Ewropayê xeniqîn û mirin hat pêşwaziya wan!

Ev çîroka koçberiya kujer, binavbûn û fetsîna di kamyonan de û girtina riya mirin û windabûnê, çîroka rojane û mehane ya vê herêma wêrankirî ye û biryara mayîna dîktatoran li paytextên Ewropayê bi wan re tattoş û satûs tê kirin, û mirov bona dîtina ronahiyekê bera xwe didin bi heman paytextî! Ev trajîdiyeke ecêb e ku nivîskar di şiyana wî de nine behs bike ku eger gemî binav bibe û dawîn henaseyên jiyanê bimijî û çav li ronahiyên bajarên Ewropayek be ku di gel celadên desthilatdar di welatê wî de mejûlî tatoş û tastûsê ne, dikarî vê felaketê fêm bikî!

Di gemiya penaberan a 14’ê Hezîranê de, serokwezîrê Yûnanê bi îdiayan got ku, ger kesên di gemiyê de Ewropî bûna, welatên Ewropayê destûr nedidan kesek bimire, ew ê hemûyan rizgar bikirana!

Ev aliyê tal ê rastiyê ye ku mînak li Îtalyayê qewimî û gemiyek ku di tengasiyê de bû hemû hatin rizgarkirin ji ber ku geştyarên Ewropî di wê de bûn.

Lê, ev ne aliyê pir tal ê vê heqîqetê ye, û ew tenê beşek ji taliya heqîqetê ye.

Beşa din a pir tal ev e ku tu welatekî Rojhilata Navîn tune ye ku ji bo bi sed hezaran mirovên ku ji Rojhilata Navîn ber bi Ewropayê ve diçin li lêgerîna Hêviya ronahiyê ya ji bo penaberan û ew ê kêfxweş bibin ku serî li we bidin tune ye! Ji wê jî taltir ew e ku ti hikûmetek li herêmê di nava heriyê de asê maye, li ser çarenivîsa van penaberan lêkolînê nake û ti hikûmet jî ji bo rizgarkirina canê van penaberên xeniqî, bi welatên Ewropayê re di têkiliyê de ye! Beşek ji çîroka tal ev e ku dewletên Ewropî ji yên Rojhilata Navîn zêdetir qîmetê didin bi jiyan û rûmeta Ewropiyan, lê ya tal ew e ku li Rojhilata Navîn tu desthilatdar nirxê nade bi rûmet û jiyana mirovan.

Di rastiyê de tişta ku di vê herêmê de ne girîng e rûmeta mirovan e. Ji ber vê yekê, ti welatek li herêmê xema wan nake ku xwedî li van penaberan derkeve û givaşan li welatên Ewropî bike ji bo rizgarkirina wan, ne jî mafê wan e ku daxwazek wiha bikin ji ber ku ew yekem in. Bersiva van welatên Ewropî dê ew be ku eger tu xema jiyana van mirovan dikî, çima li welatên wan de tu îmkanan ji wan re dabîn nakî ku bijîn, heta ku rêya mirinê negirin berahîka xwe!

Çîroka guhnedana can û rûmeta mirovan ne tenê dema cehaletê ye ku bi sedan kes li ser bizinekê hatin kuştin.

Li şûna wê, li Rojhilata Navîn ji hemû demên din ên dîrokê bêhtir bi awayekî hovane û bi dizî bêparkirina rûmeta mirovahiyê tê kirin!

Li vê Rojhilata Navîn lehiya xwînê li ser cudahiyên herî biçûk ên olî, zimanî û çandî tê meşandin û gelên her du aliyên lehiyê ji bo xwînrijandinê çepikan lêdixin.

Di heman demê de, alîgirên padîşahiyê di vê Îrana wêrankirî de bi xwe jî koçber bûne, lê ji bo Spaha Pasdaran ku şandine Kurdistanê, çiya û bajarên Kurdan dişewitîne û zarokan dikuje, çepikan lêdixin!

Di vê navberê de rejîmek ku îdia dike ku mûşekên satelayt û hîpersonîk çêkiriye!!

Lê, ew ji gora Jîna, Kyanî Pîrfelek û şehîdên din ên vê şoreşê ditirse û kevirên gorên wan dişkîne!

Tişta ku li Rojhilata Navîn ku bi dîktatorî û faşîzmê ve girêdayî ye, ne girîng e, can û rûmeta mirovan û tenê rêya vê yekê eve ku hizra xwe serdest zanînê jinav bibe û hizr û raman wekheviya mirovan cih bigire;

Nexwe, çarenivîsa bêdawî ya gemiyên binavbûyî yên li beravên Ewropayê û komkujiyên bêdawî yên li Rojhilata Navîn li ser bizin û tiştên biçûk e!



# Pêgeha reftarên malbatên şehîdan li şoreşa Jînayê de



N: Îsmaîl Şerefî
W: Hesen Mukerem

Di qonaxên cuda yên şoreşa Jînayê de, malbatên şehîdên vê şoreşê bi derkevtinên xwe yên taybet û tijî peyam, pêgeheke zindî û çalak tomar kirine. Ji destpêka şoreşê ve ku zarokên wan ji ber gulebarana rasterast a hêzên tepeserker ên Komara Îslamî ya Îranê xwîn rijandine, ne tenê kincên reş li xwe nedikirin û poşmaniya xwe nîşan nedan, belkî bi li xwekirina axabanî û ewriyan li ser trib û gorên sorxelat yên zarokên amadebûn û bi zimanek tund û azadîxwazane li dijî desthilata reş û cinayetkar a Komara Îslamî derketin.

Tevî belavkirina peyama bidawîanîna zihniyeta faşîst û totalîter, bi serbilindî behsa şehîdên xwe kirin.

Malbatên şehîdên şoreşa Jînayê li Kurdistanê ji derfet û hilkeftên taybet bi zarokên xwe yên şehîd û bi lidarxistina civîn û merasîmên taybet, ji bo berdewamiya vê şoreşê û zindî hiştina peyam û nirxên Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî zarokên anîn rojevê û bandora wan nîşan da.

Her hefteyek tevî gef û givaşên dezgehên ewlehiyê yên tepeserker ên rejîmê, bi yekbûn û kombûna li ser gorên şehîdan, silogan û peyamên Şoreşa Jînayê heta niha zindî hêlane.
Yekîtiya malbatên şehîdên şoreşa Jînayê li Kurdistanê ne tenê sînorên bajarên Kurdistanê derbas kir, belkî malbatên şehîdên navçeyên din ên Îranê jî bala wan dan bi Kurdistanê û tevî hevxemî digel hev du, peyama rabûneke yekgirtî li dijî rejîma bikujê zarokên xwe belav kirin.

Ev yekîtiya di navbera malbatên şehîdên Kurdistanê de xuyatire û di cihên din de jî bandor kir.

Di destpêkê de goristana Ayçî ya bajarê Seqizê ku termê şehîd Jînayê têde hatiye veşartin, bû cihê kombûna xelkê û malbatên şehîdan û nîşandana nerazîbûna xwe li dijî rejîmê. Piştre ev hevgirtin û yekîtiya malbatên şehîdan





derbasî gelek bajarên din ên Kurdistanê bû.

Ji Mehabadê heta Bokanê, ji Bokanê heta Ciwanroyê, ji Ciwanroyê heta Seqizê, ji Sine û Dîwandere heta Bokan û Seqizê.

Di van serdanan de, malbatên şehîdan bi komek dahênanên kêrhatî û tijî ji remz û peymanên serdemiyane û bi mifahwergirtin li hinek sembolên neteweyî, nîşan dan ku civaka kurdevarî tijî ye li potansiyel û kapasîteya modern a tekoşînê li dijî tevahiya nizameke kevneperest.

Van bi pêşkêşkirina gulên sor ji hev du re û ji hev du kirina axabaniyan, gotina sirûdên şoreşgerî, xemlandina xwe û zarokên şehîdên xwe bi kincên ala û yên Kurdî, peyameke yekbûn, jiyandost û têkoşîn li pêxema bidestveanîna armancên şehîdên xwe bilind û zeq kirin.

Bandora van reftarên malbatên şehîdên şoreşa Jînayê li ser hest û îradeya gelê Kurd û raya giştî ya gelê Kurd, biqasî kûr bû ku odeyên reş ên kompleyên rejîmê hêrs û nîgeran kir. Ji ber wê jî gelek caran êrîş kirin ser gorên şehîdan, gef ji wan xwarin û givaş xistin li ser malbatên şehîdan û hinek ji wan jî girtin û avêtin girtîgehan.

Çend caran gora şehîd Jînayê li goristana Ayçî tevîlev kirin û gorên gelek şehîdan jî li Sine û bajarên din ên Kurdistan û Îranê jî xerab kirin. Her di gel givaş xistina li ser malbatên şehîdan, roja Înê 19`ê Cozerdanê dema ku malbatên şehîdên bajarên weke Sine, Dewolan û Dîwandere li Seqiz û Bokanê serdana malbatên şehîdan kirin, di dema vegerê de hatin girtin.

Reftara malbatên şehîdên şoreşa Jînayê di van mehên han de çawan ku behs dikin di bin givaşên navendên tepeserker ên rejîmê de bûne, xwedîderketineke bê mînak û têkoşeran e ku di şoreşa nû ya Kurdistan û Îranê de li dijî nizama dîktator a Komara Îslamî cih û pêgeheke bilind û dîrokî tomar kiriye.

Ev tevger nîşan didin ku; Hejmonyaya tepeserker a rejîmê, vala û bê paşeroj e, şehîd û qurbaniyên vê şoreşê bi giştî rol û pêgeha van di bîranînên wan de zindî dimîne û gel jî bi wan emegnas û serbilind e.

Ya herî girîng jî reftarên malbatên şehîdên şoreşa Jînayê û piştevaniya gel ji malbatên şehîdan re nîşan dide ku xwediyên rastîn ên şoreşa Jin, Jiyan, Azadiyê di navenda dilê rasteqîn ê şoreşê de ne û ti îradeyek totalîter û faşîst nikare dest danê bi ser vê şoreşê û destkevtên vê de.

# Pirsgirêkên malbatî li Îrana îroyîn

N: Nîştiman Urmiye
W: Hesen Mukerem

Malbat xwedan şekl, form û fonksiyoneke taybetî ye ku her kes li gora mezinbûna mirov di malbatekê de di qatên xwe de ji nû ve çêdibe.

Malbata ku îro em hemû tê de dijîn, malbatek e ku di nava lehiya pirsgirêkan de asê maye, bi zehmet nefesê distîne û em (ferdên malbata Îranî) ne wek komeke bibandor a binegrûpê ne.

Bi gotineke din, pirsgirêkên ku îro malbata Îranî rûbirûyê wan dibin, bi taybetî li navçeyên derdor, wî\ê kiriye kesekî bêbandor di tebeqeyên cuda yên civakî de, bi gotineke din, endamên malbata îranî di bin barê pirsgirêkên giran de ne.

Rê tune ku rabe. Ger bixwaze rabe, gelek astengî li pêşiya wî hene ku îhtîmala nûjenbûnê dasxistiye di asteke pir kêm de.

Ji ber vê yekê malbata îroyîn a Îranî di nava wêraniyê de ye û xwedî jiyaneke rûreş û bêbexiyê de ye. Ev yek ji statîstîkên ku ji aliyê dezgehên hikûmetê ve hatine weşandin jî tên dîtin;
Ji anomaliyên civakî, rêjeya cinayetan bigire heta telaq, bêkarî, zewaca zarokan û...

Bo mînak, tenê di demsala Payîza 1401an de, li hember 136,064 zewacan, 5,1690 telaq an ji hev veqetiyan hatine tomar kirin. Ev tê vê wateyê ku ji her du zewacan yek jê bûye sedema telaqê. Ev yek tenê yek ji wan pirsgirêkan e ku di îro malbata Îranî pê re rû bi rû maye û ev pirsgirêk li bajarên derdor, li navçeyên kêmderfet û gundên dûr de paşxane û bandoreke berfireh heye.

Ma ev pirsgirêk û gelek pirsgirêk din bi serê xwe bê bingeh derketin? Divê di bersiv de bibêjin na.



Ji ber ku tiştê ku em îro dibînin bi salan e bi sazîbûne, ji ber ku ji holê rakirina vê jî heman pêvajo dimeşe, bi awayekî ku wan civakek bê rêxistin û rêxistinkirin hiştin ku normên lawaz bi hev re nakok bin û civak di rewşekê de be. ne-norm û bê organîze bin, ji ber ku her roj em dibin şahidê guherînkariyên civakî yên bi awayekî neyînî, û ev hevsengiya girîng di navbera nakokiyan de çê dike.

Malbat di destpêka vê eksê de cih digire, bi gotineke din, nakokî ji vê rêyê qut dibin, pirsgirêkên ku em îro di nav malbatên Îranî de bi taybetî li bajarên derdorê dibînin, mîna çêbûna sperm û embrîyoyan di zikê wê de ne.

Hikûmeta bêsîstema ku ji bo vê zarokê ji zayînê heta pîrbûnê ji bilî vê tu armancên wê nîne. Divê were zanîn ku koka pirsgirêkên ku em di nav malbatên xwe de rû bi rû dimînin (ji debarê heta normatîf) dikevin pergala qirêj a ku di têkbirina çarçoveyên bingehîn de tu astengiyekê nabîne.

Di bin navê esas û pîvanên xwe de, rêya ku ber bi riya rast a malbatê ve diçe, bêbandor dike, lewra pêşanî û rihê gelek tiştan di binê terazûya desthilatdar de dimîne.

Û girseyên belengaz bi xizaniya çînî re jiyanek dijwar heye.

# Hisên Qayidî: Em hewl didin jinên Êzidî ji Holê derxînin



Berpirsê Ofîsa Karbûbarên Rizgarbûyên ji Destê DAIŞê Hisên Qayidî ragihand ku heta niha gelek jinên Kurdên Êzidî di Kampa Holê ya li Rojavayê Kurdistanê de mane û newêrin xwe eşkere bikin. Hisên Qayidî herwiha got: “Em hewl didin jinên Êzdî ji Kampa Holê derxînin.”

Berpirsê Ofîsa Karbûbarên Rizgarbûyên ji Destê DAIŞê Hisên Qayidî ji Rûdawê re ragihand ku proseya rizgarkirina revandiyên ji aliyê çekdarên DAIŞê ve berdewam e, û ew li bendê ne ku di rojên pêş de çend kesên din bêne rizgarkirin.

Hisên Qayidî diyar kir ku “niha çekdarên DAIŞê li Mûsilê nemane, lê li Sûriyê û hinek cihên din mane. Zanyarî li ba me hene hêj gelek di nav Kampa Holê mane.”

Qayidî da zanîn ku zanyarî cem wan hene ku heta niha gelek keç û jinên Kurdên Êzidî li Kampa Holê ne, lê newêrin xwe eşkere bikin.

Derbarê xebatên bo rizgarkirina keç û jinên Kurdên Êzidî yên ku ji aliyê DAIŞê ve hatin revandin de jî Hisên Qayidî got: “Planên me yên rizgarkirina kesên revandî hene ku em wan vegerînin. Berî niha 6 jinên Êzidî hatin rizgarkirin, niha kar li ser tê kirin hinek din jî bên rizgarkirin. Ji ber kar û xebatên Ofîsa Rizgarkirinê ya taybet a Nêçîrvan Barzanî em spasiya wî dikin. Herwiha Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hêzên Pêşmerge gelek alîkar bûne.”

Berpirsê Ofîsa Karbûbarên Rizgarbûyên ji Destê DAIŞê di heman demê de amaje bi wê yekê kir ku hikûmeta Iraqê û civaka navnetewî di rizgarkirina Kurdên Êzidî de ti gavek neavêtine.

Li gorî amarên Ofîsa Rizgarkirina Revandiyên Kurdên Êzidî ku di meha Adara îsal de belav kiriye, DAIŞê 6 hezar û 417 Kurdên Êzidî revandin, ji wê hejmarê 3 hezar û 548 kes jin û 2 hezar û 869 mêr bûn. Ji van 3 hezar û 562 kes hatine rizgarkirin û 2 hezar û 693 kes jî hîn winda ne.

Kampa Holê

Kampa Holê ya ku malbatên DAIŞiyan lê dimînin dikeve rojhilatê parêzgeha Heseke ya Cizîr a Rojavayê Kurdistanê.
Li gor amarên Netewên Yekbûyî li Kampa Holê, 66 Hezar û 101 kes hene, ku ji 60 welatî çûne Sûriyê û tevlî DAIŞê bûne. Ji %39 ji wan xelkên Sûriyê ne, hejmara wan 25 Hezar û 780 kes in.

Ji %46 ji wan Iraqî ne, hejmara wan 30 Hezar û 724 kes in. Ji %15 ji wan xelkê welatên din in, ew jî 9 Hezar û 597 kes in, û xelkê 66 welatan in.

Li Kampa Holê 18 hezar û 208 malbat hene û %96 ji wan jin û zarok in, %66 ji wan zarokên di bin 18 salî re ne.

Li gorî amarên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya ji bo zarokan, UNICEFê, hejmara zarokan li wê kampê 28 hezar in. Bêhtirî 7000 zarok ji wan, xelkê welatên din in. 77 zarok sêwî ne, bav û diyên wan di şer de hatine kuştin. 12 hezar girtiyên çekdarên DAIŞî jî hene.

# Norwêj; Ji bo rêzdar Miſtefa Hicrî semînerek rêkxiſtinî hate lidarxiſtin

Semînerek rêkxiſtinî bo birêz “Miſtefa Hicrî” Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdiſtana Îranê li devera Osloyê, bi beşdariya hejmarek berçav ji endamên Hizbê bi rê ve çû.

Roja Yekşemî 28ê Cozerdana 1402 a Rojî, Komîteya Partiya Demokrat a Kurdiſtana Îranê li devera Osloya Norwêjê, semînareke rêkxiſtinî bo birêz “Miſtefa Hicrî”, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdiſtana Îranê, bi beşdariya hejmareke berçav ji endamên hizb, lidar xiſt.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdiſtana Îranê, tevî nîşandana kêfxweşiya xwe ji bo hevdîtinkirin digel beşek ji endamên Hizbê li welatê Norwêjê, piştî behskirin li ser yekgirtina refên Hizba Demokrat, behseke giştî li ser rewşa Îraqê û pêkhateyên wê û Herêma Kurdiſtanê pêşkêş kir ku cihê akincîbûna rêberî, kadr û pêşmergên Hizba Demokrat a Kurdiſtana Îranê û hêzên din ên Rojhilatê Kurdiſtanê ye.

Rêzdar Miſtefa Hicrî behsek li ser givaşên Komara Îslamî ya Îranê li ser Îraq û Herêma Kurdiſtanê û deſtêwerdana wê rejîmê di nav karûbarên Îraq û Rojhilata Navîn de kir.

Paşê navbirî behsek li ser pêwîſtiya yekgirtina refên Hizba Demokrat û şoreşa “Jîna” û çanihêriyên xelkê Rojhilatê Kurdiſtanê û heta hêz û aliyên neyar ên Komara Îslamî ya Îranê ji Hizba Demokrat kir û ew yeka bi roleke girîng bo Hizba Demokrat da zanîn û îşare bi wê yekê kir ku divê rol û reftar û biryarên Hizbê bi giştî di aſta çavnihêriyan de bin.

Birêz Miſtefa Hicrî di beşeke din ji axavtinên xwe de, behsa berdewamiya Navenda Hevkarî, civîn û gotûbêj digel tevahiya aliyên Rojhilatê Kurdiſtanê û hêzên hevpeyman li seranserê Îranê kir û cih û pêgeha Hizba Demokrat bilind nirxand û îşare bi diyalog digel aliyên Kurdiſtanî bi taybetî û aliyên Îranî bi giştî ku baweriya wan bi demokrasiya raſteqîne û mafê neteweyan li Îranê heye, kir û



li ser wê yekê tekezî kir ku divê em guherinkariyê di zihniyeta xwe de bînin û hevdu bi hemû bîr û baweriyên cuda ve qebûl bikin.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdiſtana Îranê di dawiya axavtina xwe de, li ser paraſtina nezm û dîsîplîna Hizba Demokrat tekezî kir û ji endamên Hizbê re daye zanîn ku nabe bi ti awayekî di nav torên civakî de digel alî û kesên din şerê derûnî bikin û divê di nav torên civakî de xwe ji hemû axavtinên naşîrîn û bêrêzîkirinê biparêzin, çimkî ewa ji ferhenga Hizba Demokrat û usûla demokrasiyê dûr e.

# Rejîma Îranê pîlana terorkirina “Mewlewî Ebdulhemîd” heye

Piştî binçavkirina kesekî cihê şik û gumanê yê ser bi Spaha Pasdaran li Mizgevta “Mekkî” ya bajarê Zahidanê, eşkere bûye ku wî xweſtiye “Mewlewî Ebdulhemîd” teror bike.

Pêka rapora “Halweş”ê, piştî binçavkirina kesekî cihê şik û guman ê xelkê devera “Dilgan”ê li Mizgevta “Mekkî” ya bajarê Zahidanê, eşkere bûye ku Spaha Pasdaran xweſtiye bi rêya wî kesî ve, kesayetiyê olî û pêşnimêjê Mizgevta “Mekkî” ya bajarê Zahidanê “Mewlewî Ebdulhemîd” jehrî bike.

Herwisa Halweşê daye zanîn, ku wî kesî îtiraf kiriye ku Îtilaata Spaha Pasdaran ew jehre bo terorkirina “Mewlewî Ebdulhemîd” bi navbirî re daye û her heftiyê 15 milyon Tumen jî bi wî re hatiye dan ku vê terorê encam bide.

Piştî agehdarbûna xelkê ji vê rewşê, xelkê bajarê Zahidanê rû bi Mizgevta “Mekkî” ve çûne û înterneta bajar jî raſtî qutbûn û pirsgirêkên micid hatibû û rewşeke ewlehî ji aliyê hêzên ewlehî û leşkerî yên rejîmê ve, bi ser bajarê Zahidanê de hatibû sepandin û rêyên hatinûçûn bo derveyî bajar kontrol dikirin.

Herwisa ofîsa “Mewlewî Ebdulhemîd”, roja Duşemî 29ê Cozerdanê, bi belavkirina daxuyaniyekê, bas ji binçavkirina kesekeî cihê şik û gumanê li Mizgevta Mekkî kiriye û gotiye ku ew kese girêdayî bi çend navendan e û nabe xelk nigeran bin û hewce ye xelk aramiya xwe biparêzin.

Mewleyî Ebdulhemîd, cih û pêgehek bilind di nav xelkê Belûçiſtanê de heye û di dema şoreşa Jînayê de ji bo rabûna xelkê Belûç li dijî rejîma Îranê kesek bi bandor bû û her lewma rejîma Îranê bi hemû awayî hewl dide wî kesayetiyê olî û naskirî ji holê rake.



# Silêman Keleşî: "Kişandina hêz û cebelixanê li aliyê Komara îslamiya Îranê bo ser sînorê Herêma Kurdistanê, dikare gelek armancê wê hebin."



## Silêman Keleşî

**Me digel rêzadar Silêman Keleşî li derheq veguhastina çek û cebelxaneyan ji aliyê Spaha Pasdaran a Îranê bo Herêmên sînoyî yên di navbera Rojhilatê Kurdistanû û Hermêna Kurdistanê hevpeyvîn pêk anî û navbirî di vê barê de got: "Kişandina hêz û cebelixanê li aliyê Komara îslamiya Îranê bo ser sînorê Herêma Kurdistanê, dikare gelek armancê wê hebin."**

**Hevpeyvîn: Hesen Mukerem**

**P: Rêzdar Silêman Keleşî di heyamên borî de me nûçeyên kişandina hêz û cebelxaneyan ji aliyê Spaha Pasdaran ve bo sînorên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de bihîstin bi nerîna we çima Komara Îslamî tevî vê ku dibîne partiyên kurdî yên Rojhilat ti tevgerek tinîn lê dixwaze êrîşî ser wan bike?**

**B:** Pêş hemû tiştekî da sipas bo ked û xebata we û hêviya serkeftinê bo we dixwezim.

Pêş wê hindê ku bersiva pirsa we bidim, dixwezim bêjim ku partiyên Rojhelatê Kurdistanê Xêncî tevgera çekdarî li hemû barê din de bi awayekî aktîv tevger hene.

Bo nimûne, li Şoreş û serhildana Jin, Jiyan, Azadî, dijî Komara Îslamiya Îranê de Patiyên Kurd yên Rojhelat neqiş û rolê rêberiyê li Kurdistanê de hebûn û vê yekê bandor li ser hemû Îranê jî hebû.

li ser pirsa kişandina hêz û cebirxanê li aliyê Komara îslamiya Îranê bo ser sînorê Herêma Kurdistanê, dikare gelek armancê wê hebin. Yekek li armancên vê ev yeka ye ku wisa nîşan bide û bêje xelkê Îranê dev ji wê raperîn û şoreşê berdin û Îran ji aliyê dijminên derwey wek Îsraîl û Amerîka bi rê û havkariya hêz û partiyên Rojhelat ve li xeter û tehdîdê de ye û bi vî away bîr û hizra xelkê Îranê li ser şoreşa Jin, Jjiya, Azadî, rê derêxe û bera wê bide derwey sînorê Îranê. Ya duyem: Rêjîma Îranê bi vî away dixweze raste rast û neraste rast Herêma Kurdistanê tehdîd bike û bigavişîne heta xwast û armancên van cî bi cî bike. Yekek li xwast û armancên van jî çek û bêbandor kirina hêz û partiyên Kurd ên Rojhelat in ku li wê Herêmê de niştecih in.

Ya sêyem: Karbidestên Îranê bi vî karî dixwezin hêz û dewletên herêmî û navnetewey biceribînin kanê helwêst û gotinên van yê çi bin û ev jî gorî van helwêst û gotinan kar û armancên xwe bibe pêş. Her wisa dikar gelek armancên din jî hebin.

**P: Rêzdar Silêman Spaha Pasdaran her çend berê jî êrîşên mûşekî û dronan li ser kampên penaberan kiriye hûn bêjin dubare vê kiryarê encam bide û rastî ti bertekên navnetewî nebe?**

**B:** Di heqîqetê de, Komara Îslamiya Îranê, çi pirensîpên exlaqî, mirovî û navneteweî ber çav nagire û naparêz e, ji ber vê yekê jî dikare hemû karekî dijî pirensîpên navneteweyî û mirovî bike, her wek heta niha kiriye. Lê, çi bertek û reakstion navnetewey yê hebin, di heqîqetê de rejîma Îran li dirêjahiya temenê xwe de nîşan daye ku li helwêst û bertekên gazinde û mehkum kirinê natirse û qîmetekê nade van. Komara Îslamî tenê ziman zorê û helwêstê emelî ditirse.

Heta niha jî civaka navnetewey jî reaktioneke tund û emelî li dijî van kiriyarên rejîma Îranê nebûye.

Her bo nimûne demekê pêş niha de terorîstê xwe yên girtî li welatê Ewrupayê de ber çavê dinyayê û civaka navnetewey di gel hindek girtiyên sivîl yên bêtawan yên Eurupayê guhartin û bi bê vê ku di gel helwêsteke berçav ya civaka navnetewey rû bi rû bibe. Ji ber vê yekê her hêz û welatek berjewendiyên xwe diparêzin.

Nabe em Kurd çi dema ser vê bingehê siyasetê bikin. Civaka navnetewey û zilhêz dinyayê yê vê demê helwêstê bona pêşîgirtin li karê Îranê bikin kû berjewendiyên van bixwezin.

Lewma jî her dem îmkanê hindê heye ku Komara Îslamî bi her away êrîş bike ser kampê penaberên Rojhelat li Herêma Kurdistanê.

**P: Rêzdar Keleşî bi nerîna we dibe Komara Îslamî ya Îranê bi hinceta hebûna penabrên kurd ên Rojhilat li Herêma Kurdistanê vê parça Kurdistanê tevlî şer û nearamiyan bike an dibe mebesta wê tûjkirina kurdan li dijî hev du be?**

**B:** Komara îslamî Îranê çi dema naxweze aramî li Hde hebe, lewma aramiya Herêmê bi qazancê xwe nizane. Her wek dibînin kudera deverê destê van hatibe ne raramî, şer û dijberiyê çê dike:

Bo nimune li Lobnan, Suryê, Yemenê û bi xasmay li Iraqê û Herêma Kurdistanê. Ewa ku dixwezin Kurdan bîne hemberî hev du, ev ne siyaseteke nû ya dagirkerên Kurdistanê ye, belkî her dema bizavên Kurdî çê bûne û xebat kirin e, hertim dewletên dagirker xwastine Kurdan bîne hemberî hev du, da ku dijî yektir şer bikin, êdî ev çi şer li nav parçeyek Kurdistanê de be û çi jî kurdê du parçan bîne hember hev du û şerê kurd bi Kurd saz bikin, mixabin mînak û nimûneyê van yên wiha pir in ku naxwazim wirda behs bikim.

**P: Rêzdar Silêman Keleşî bi nerîna we eger Spaha Pasdaran bi hinceta partiyên kurd yên Rojhilat êrîşî ser Herêma Kurdistanê bike, Hevalbendiya Herêmê ya di gel Amerîka û welatên ewrupayê dê bertek nîşan bidin û rê lê bigirin?**

**B:** Ya rastî bertek û helwêsta Hevbendiya parastina Herêmê bi rêberiya Amerîka, zêdetir girêday bi du tiştan e, ya yekem girêday bi wê yekê ye ku Îran dê bi çi away êrîşî ser Herêmê û kampê penaberên Rojhelat bike. Eger Îran her wek heta niha êrîş kiriye û her wisa bike, ez bawer nakim ku Hevbendî bertekeke ku heta niha kirî li wê zêdetir bike.



Lê, ya duyem bi dîtina zor girînge, ev yeka ye ku ev êrîşa çiqasî dijî berjewendiya Hevbendî û Amerîka ye. Gelek caran Hevbendiyek behane û hegerekê digere ku welatekî tenbî û ceza bike.

Li ser tiştekî zor piçuk bertekeke tund û emelî digrin, car û bar jî çavê xwe digrin û piresîpên xwe binpê dikin û bertek û helwêstê nagrin.

Ez ewê jî bêjim ku ev Hevbendî tenê êrîşa Îranê li ser Herêma Kurdistanê wek delîl û faktor nîşan bide bo bertek û helwêsta xwe, lê delîla nepenî û eslî ya vê helwêstê piştgîriya Îranê li Rusiyayê li şerê navbera Ukraniya û Rusya be. Îran dikare bêje Hevbendiyê ez çî din piştgîriya Rusyayê nakim û hûn jî bêdeng bin ez bikarim êrîşî kampê neyarê xwe li Herêma Kurdistanê bikim.

Meqseda min ewe ku tenê tiştên em dibîn û dibihîsin ninin ku rol dilîsin, li bertek û helwêstê Hevbendî û dewletan de.

**P: Rêzdar Silêman Keleşî dawîn pirsa me ye, hûn bêjin ev hemû nakokiyên di navbera Herêma Kurdistan û Bexdayê de destê Spaha Pasdaran tê hebe?**

**B:** Her dizanin hikumetên pêşîn ên Iraqê heta ji navçûna Sedam Husên jî li destê Erebê Sune meseb de bûn. Lê, her çend piraniya xelkê Iraqê misilmanên Şîe meseb in û xwe gelek nêzîkî rejîma Îranê dizanin.

Wê gavê sê koçkeyê hêzê yên diyar li Iraqê heye, wek Kurd, Erebê Sune û Şîe her wisa hindek hêndek hêzên din ên piçuke netewey û Olî.

Ev hêzane jî di gel hev yekgirtî ninin. Ji vê yekê jî belê Spaha Pasdaran û rejîma Îranê tewawiyeta xwe li wî zirofa navxwe ya de Iraqê mifa wergirtiye û kariye bandora xwe li rêveberiya wî welatî bike û heta hêz û rêkxistinên çekdarî yên girêday xwe pêk bîne. Dîsan dibêjim rejîma Îran yekek li amil û sebebên ne aramiya Iraqê û pêk nehatina Herêma Kurdistanê û Bexdadê ye.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî:”**

Cudahîxwaz ew in ku hemû mafê neteweyên Îranê paşguh avêtine.



**“Mesûd Barzanî”:**

Yan Kurdistan yan neman.



**“ Mikhail Bogdanov :”**

Çareserkirina pirsa Kurdî li Sûriyê ji Amerîka re ne giring e.



**“Emmanuel Macron:”**

Divê Ewropa qada xwe ya ezmanî biparêze bêyî ku xwe bispêre Amerîkayê.

# Serokkomarê rêjîmê, lat lûtan ji bo qedandina serhildana Jînayê bi kar tîne!



**N: Eskender Ceiferî**

Ji havîna derbasbûyî ve, piştî ku serhildana Jînayê li Kurdistanê destpê kir û pişt re gihaye Îranê, rêjîmê nekariye vê serhildanê kontrol bike.

Niha jî rêjîma dagirkar a Tehranê, ji bo ku bikare şoreşê kontrol bike, lat û lûtan bi kar tîne.

Piştî ku Îbrahîm Reyîsî serokkomarê nû yê rêjîmê, ew jî di rêbaza çewt a bikaranîna lat û lûtan de berdewam e. Niha Reyîsî biryar standiye ku Sipaha faşîstên Tehranê, ji bo ku bikare serhildanê biqedîne, lat û lûtan rêkxistinî bike. Pere bide wan û ew jî li pêşiya xelkê serhildêr derkevin.

Ev jî di demekê de ye ku hin kesan, ji bo ku xelkê bixapînin digotin deng bidin Reyîsî ewê mafên we bide we. Di van 44 salan de her ji dema propagendeyên hilbijartinan ve heya hatina serokkomarekî din ê rêjîmê, lat û lût, tim ji aliyê rêjîmê ve ji bo tepisandina xelkê hatine bikaranîn.

Ji bilî vê, di van 44 salan de tepisandina neteweyên nefars jî her berdewam dike.

Ji sala 1979’an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê û hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ê gelê xwe.

Di 11 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tiştekê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikin.
Di salên di navbera 1979’an de heya 1981’an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981’an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedînijad her yek du salan serokkomar bûn. Hesen Rûhanî jî piştî wan hat û piştî wî, Îbrahîm Reyîsî hat. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînijad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009’an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînijad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasiya rejîmê, gelek dengan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînijad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwediya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017’an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingehîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwediyê pêgeheke bilind bû.



Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dûrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li pişta Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de pişta Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dûrxistina wî ji posta serokkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwast bibin berendamên serokkomariya Îranê. Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009’an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînijad de serkevin.

Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dengan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Taybetmendiyeke hevpar a hemû serokkomarên rêjîmê jî ew e ku lat û lûtan ji bo tepeserkirina xelkê bikar tînin.

Niha jî dîsa serokkomarekî din ê rêjîma faşîstên Tehranê, ji bo kontrolkirina serhildanê, lat û lûtan bi kar tîne. Lê vê carê pir ciyawaz e ji ber ku tevahiya neteweyan li fijî vê rêjîma gemar rabûne ser piyan.

# Dirêjkirina qeyrana Sûriyê bo demekî nediyar



**N: Ebduleziz Qasim**

Heta niha û piştî zêdetir ji duzde salan li ser jiyê qeyrana Sûriyê ku bi dehan kongir û civînên herêmî û navdewletî li ser vê qeyranê hatine lidarxistin û çend biryarên navdewletî ji aliyê Neteweyên Yekgirtî hatine standin ji wan biryara 2254 li sala 2015'an, lê hêşta ti bersiv li ser pirs û sedemên zehmetiya bidawîkirina vê qeyran û aloziyê nehatine dan.

Di van çend rojên borî de, rewşa Sûriyê careke din bi kêmayî di sê civînên herêmî û navdewletî de ket di rojevê de, bi taybetî di lûtkeya komkara Erebî de (lûtkeya Cidde) ya bi beşdariya serokê rêjîma Sûriyê di 19-20ê Gulana 2023an de, ku têde têkiliyên dewletên Erebî bi Şamê re hatin nûkirin, herwiha krîza Sûriyê ket di rojeva lûtkeya Koma 7 welatan de ku di 21ê meha borî de li bajarê Hiroşîma yê Japonê hatibû lidarxistin, ku têde behsa kirîza Sûriyê û pêwîstiya çareseriyeke siyasî li gor biryara Navnetewî 2254 hatibû kirin, zêdebarî lidarxistina 7'emîn konferansê piştgiriya Sûriyê li Bruksel ji aliyê Yekîtiya Ewropî ve, ku di 15ê meha Cehzîranê de hatibû lidarxistin. Amadebûna serokê Ukrayna Zelenskî di lûtkeya komkara Erebî de û herwiha di lûtkeya grûpa 7 welatan de, tiştek herî balkêş bû, ku wisa xuya dike, ku piştgiriya Ukrayna pitir bala dewletên zilhêz û Neteweyên Yekgirtî dikişîne ji her pirsgirêkên cîhanê yên din û herwisa ku dixuye ku kêşeya Ukrayna dê çareser bibe li pêş qeyrana Sûriyê jî, ku pirsa Ukrayna girîngiyek taybet heye, lewra tê çaverêkirin ku mijarên girêdayî bi çareserkirina krîza Sûriyê ve bo demek nediyar bêne paşxistin, heta radeyekî dibe bo demekî dirêj wekî krîza Kiprusê (Cyprus) ku her ji sala 1974an û heta îro berdewam e, ku hîç çarseriyek bo nehatiye dîtin, nemaze ku Tirkiyê hewl dide heman ezmûna xwe dagîrkariyê ya li bakurê girava (Cyprus) li ser bakurê Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) dubare û kopî bike, nemaze digel bêdengiya civaka navdewletî li hember êrîşên rojane yên Tirkiyê û çeteyên wê li dijî gelê kurd, ku li gorî gelek çavkaniyan û heta di medyaya Tirkiyê de jî, behsa wê yekê dibe ku Enqere li bakurê Sûriyê bi heman şêweyê dagîrkirina girava (Cyprus), dest bi heman pêngavan bike bi armanca hebûna xwe ya hertimî û guhertina demografî ya wan deverên dagîrkirî bi taybetî li deverên kurdî wekî Efrîn, Cerablis, Girêspî û Serêkaniyê, nemaze piştî serkeftina Erdogan di helbijartinan de, ku wê dest bi timamkirina pirojeyên xwe yên li dijî gelê kurd yê Rojavayê Kurdistanê bidomîne.




# Kurê Wezîrê Berê yê Berevaniya Sûriyê grûpeke nû ya leşkerî ava kir



Kurê Wezîrê berê yê Berevaniya Sûriyê Mûnaf Mistefa Tilas encûmeneke leşkerî ya bi navê "Eniya Rizgarkirina Niştimanî ya Sûriyê" ava kir.

Eniya Rizgarkirina Niştimanî ya Sûriyê piştî ragihandina encûmena leşkerî ya Sûrî daxuyaniyek belav kir.

Di daxuyaniyê de ku li Şamê hatiye tomarkirin, fermandarekî Eniya Rizgarkirina Niştimanî ya Sûriyê destpêkirina karê meydanî ragihand.

Eniya Rizgarkirina Niştimanî ya Sûriyê bi fermandariya general Mûnaf Tilas hatiye avakirin.

Mûnaf Mistefa Tilas di sala 1964an de li Resten a ser bi Himsê ve ji dayik bûye û kurê Wezîrê Berevaniyê yê Sûriyê yê berê Mistefa Tilas e.

Herwiha Mûnaf Mistefa Tilas fermandarê Lîwaya 104 a Pasevanên Komarî bûye û pir nêzikî Serokê Sûriyê Beşar Esed bû.

Tilas di Tîrmeha 2012an ji artêşê cuda bû û çû Tirkiyê û niha li Fransayê ye

Ebû el-Mejid Nasir, Rêveberê Navenda Rastiyê û kesayetiya opozisyonê ji başûrê Sûriyê ji Tora Medyayî ya Rûdawê re got, dirustkirina Encûmena Leşkerî di çarçoveya rikaberiya li ser dosyeya Sûriyê de tê.

Rêveberê Navenda Rastiyê Ebû El-Mejid Nasir got "Piştî dûrketina bi çend salan ji rewşa Sûriyê, niha berêz Mûnaf Tilas tê û dirustkirina Encûmena Leşkerî radigihîne, li jêr navê Tevhera Rêzgarkirinê ya Sûrî.

Em dikarin ragihandina vê Encûmenê bixin çarçoveya rikaberî û pêşbirkiya di navbera çend pêvajoyan de di pirsa Sûrî de ku her yek ji van rêrewan hewl dide ku pêşdest be.

Wekî pêvajoya Astana-Sotçî ku Tirkiye, Rûsya û Îran endamên wê ne, û pêvajoya Amerîkî ku çend welatên Ewropa, an jî Yekîtiya Ewropayê ligel wê ne û pêvajoya Erebî yan pêvajoya Komkara Dewletên Erebî."

Ji bilî Artêşa Sûriyê, Encûmena Leşkerî ya Sûriyê dibe pêncemîn pêkhateya serbazî li Sûriyê.

Li bakurê Sûriyê Artêşa Niştimanî ya Sûrî, li bakurê rojavayê Sûriyê Desteya Tehrîr el-Şam û li navçeya Tinifê Artêşa Sûriyeya Azad û li bakurê rojhilatê Sûriyê hêzên HSD desthilatdar in.

# Jiyan bi bê muzîkê çi cihenemeke



**N: Vênûs Fayq**
**W: Hesen Mukerem**

Ji bo vê ku bi tena serê xwe demekê derbas bikim an di gel mirovekî demê parve bikim, muzîkê guhdarî dikim, her weha jî karekî hunerî ye û hunermekê dihesibînim.

Guhdarîkirina bi muzîkê re hewce ye, çimkû mei`dê min vala dibe û xwarin li hundirî dikim, her weha hemû hizra xwe bi muzîkê re tijî dikim.. Hinek deman jî bi qasî duayan, bedenê hewcehî bi dîlanê heye, lê çi dîlanek?

Ev dîlana ku ruh têr dike û di nav sirûşta îlahî de niqûm dibe..

Dçlan, bi wate û felsefeyekê mîna ya ku Sofî, bi mebesta bêdengkirina şehwet û daxwaziyên taybet, bi guhdarîkirina li Xweda û muzîk, hizkirin û hereketkirin li dewra xwe ku wateya vê hereketa cîhanan e li dewra Rojê wergirtine, û pêş û paşê dîlana Sofiyan jî mirovahî bi dîlankirinê re nasyar bûne û berfirehî danê..
Nietzsche dibêje: Bi bê muzîk jiyan dibe şaşiyeke mezin ...

Sehra muzîkê di vê yekê de ye ku mîna çawa ku melevanek xwedî bedenek zirav û bedew e, wisa jî yê ku bi muzîk re dijî, xwediyê kesayetiyekî zirav û bedew e.

Her mîna Xweda hebandineke ronahî bi bê xewê jî ku li ser bermalê an di nav mala Xwedê de mejûlî xurtkirina vê têkiliya efsaneyî ye di gel Xweda de, dîlanker jî, bi wateya bilind û bi bê xewa vê ye ku hewldane bo bilindkirina ruh bo cîhaneke bilind a ku mirov li hundirî de digihîje bi pileya Xwedavendan..

Axê em ya ku di tevahiya di jiyana xwe de encam didin rêyeke ku ber bi aliyê Xwedayekê radixin, êdî bi muzîkjeniyê an nimêjkirin an dîlankirin be, di dawiyê de, xwarinê didin bi ruhê xwe.

Çimkî nimêjkirin ruhê dua û xweda hesibandinê ye, muzîk ruhê cîhanî ye, ev her du baskên han ku bi wan difrin û jiyanê di tiştên mirî de jî peyda dikin..
Çi cihê ku hemû bedena te guhdarî muzîkê bike, axê yê dizane muzîk çiye tenê bi guh guhdarî muzîkê nake, hemû xirmaya wî\ê di xweşî birin li sehra muzîkê de pişkdariyê dike.

Êdî dema ku guhdarî hinek muzîkan dikî nikarî bedena xwe nevilvilînî, nikarî hundirî cîhanekê bibî ku dişibe bi cîhana Sofiyan.

Ehlam Mistexanî di yek ji romanên xwe de dibêje: “Neku sekoya dîlanê bicih bihêlî, bo vê ku jiyan te bicih nehêle”, “Seko” peyveke mecazî ye, her cihek û her demekê ku tenê te keyf pê hat, bedena xwe tevdigerînî, muzîk berdewamiyê dide bi zîndîbûna beden û ruhê me, ruh û hizrkirina me ji nû ve vedike...
Wisa hesab bikin ku di cîhanê de muzîk tunebe, jiyan li ser vê erdî çiqas bêzarker dibû.

Dengê ber verîna pelgên daran û ev bayê ku wan pelgan tevdigerîne û çîve çîva çivîkan û qibe qiba Kewan, hişe hişa ava rûbaran û heta hareya otomibîlan jî, ku li kêlega me derbas dibûn û dengê pêngavên rêwiyan jî hemû muzîk in. Eger ev dengên han tunebûna jiyan dibû çi cihenemek..



Celaledînê Romî hezkirin û dîlankirin û muzîkê di gotineke pir ciwan de bi hevre vedihûne û dibêje: Bi bê hezkirinê tevahiya muzîkan tenê xişe xiş in û her dîlankirinek û xweda hebandin jî bêgariye..

Axê eger hezkirina Xweda tuneba, çi tiştek wisa ji wan derwêşan dike ku bi wî awayî dîlan bikin û tevahiya bedena wan li cihekê û ruhê wan li cihek din be, duayan dikin? Romî, bawerî bi muzîk, helbest û dîlanê hebû û bona gihîştin bi Xweda dibêje: “Ev mirovê ku xweşiyê li muzîkê dibîne namire.” Herwisa dibêje:

“Gudarî Bilûlê bike û xweşiya xwe nîşan bide û ji hev veqtînê rexne dike.”
Ger em tenê ji bo xwe nimêjê bixwînin û dîlanê bilîsin, an nimêj û dîlan her yek li cihê kêrhatî û pêkar li gor xwe bên encam dan, êdî ne nimêj xwendina te bo hêrskirina min dibe û ne dîlana min jî bo bêzarkirina te dibe.

# Amed: Nasnameyên 9 kesên ku canê xwe ji dest dan eşkere bû

Navê 9 kesên ku di şerê çekdarî yê li navçeya Bismilê ya Amedê de canê xwe ji dest dabûn eşkere bûn.

Li gundê Şidad û mezraya Sari Huseyîn navçeya Bismilê ya Amedê, ji ber nakokiya li ser erd û zeviyan şerekî çekdarî derket.

Sala borî jî di navbera malbatên Alyamaç û Taş ên ku xizmên hev de li ser 400 donim erda xezîneyê li nîqaş derketibû.

Di dema ku alozî berdewam dikir, di navbera malbatên Taş û Almayaç ên ku danê sibehê ji bo berhevkirina dexlûdan çûne ser erdan de nîqaş derket û nîqaş zû veguherî şer. Di şer de 9 kesan canê xwe ji dest dan û 2 kes jî birîndar bûn.

Nûçegihanê Rûdawê Abdulselam Akincî diyar kir ku cenazeyên 9 kesan li Saziya Tiba Edlî ya Amedê ne û dermankirina 2 birîndaran jî berdewam e.

Nasnameyên kuştiyan hatin eşkerekirin

Li aliyê din navên kesên ku di şerê çekdarî yê di navbera her du malbatan de canê xwe ji dest dane jî hatin eşkerekirin.



Ji malbata Alyamaç 5 kesan canê xwe ji dest dan.
Hat ragihandin ku ji malbata Alyamaç, Emîn Alyamaç û Selîm Alyamaç birayên hev in. 2 jî kurê Selîm Alyamaç mirine, navên wan Mihemed Alyamaç, Omer Alyamaç in, her wiha yek ji wan jî biraziyê wan Yûnis Alyamaç e.
Ji malbata Taş 4 kes hatin kuştin ku her çar kes jî pismamê hev in.
Hat ragihandin ku ji malbata Taş jî 4 kes mirine ku her çar kes jî pismamê hev in. Navên wan; Halîl Taş, Serhat Taş, Orhan Taş, Mehmet Can Taş.

# Êdî Kurd hişyar û hişmend e



**N: Hesen Mukerem**

Ev amûra ku mirov li ser dixebite û ev sirûşta ku li hundirî de dijî, li ser hiş û derûn û reftara mirovan bandor dike û xelkê Kurd jî li çiya û qontaran û di bin bombebaran û top û balafiran jiyan e û di gel komek hizr û baweriyên cuda û ji hev dûr û nêz rû bi rû bûne. Weke hizra Demokratîk, hizra Komonîst û Îslamî û ... hwd.

Lê, tevahiya wan hizr û baweriyan, baweriya neteweyî jî tevlî dikin.

Çimkî bi bê baweriya neteweyî, tu aliyek nikare di nava netewa xwe de cih bigre, lewma yên ku baweriya wan bi pirsa neteweyî tunebû, nevêran xwe nîşan bidin û ji ber vê yekê û hin sedemên din di heyama xebata partî û aliyên Kurdî li dijî dagîrkeran de, gelek caran cudahiya baweriyên wan bûne sedem ku di navbera partî û aliyên Kurdî de ji ber qebûlnekirina hev du, şerê bira kujiyê çê bibe.

Ev kirayrên wan pir caran bandora nerênî danye ser baweriya hin kesên netewî, mixabin di dîroka tevgera netewieya Kurd de gelek mînakên tal hene.

Bi keyfweşî ve, bi derbasbûna demê û bidest xistina ezmûnan ji aliyê partî û aliyên xebatkar yên Kurd û serderîkirin ji pîlanên dagirkeran yên bona afirandina tevdanî, fitne û çêkirina şer di navbera Kurdan de, niha ev gihîştine vê encamê ku şerê birakujî û dijberiya birayên xwe yên Kurd xeynî sûd gihandin bi dagirker û berfirehî dan bi dagirkeriyê di nav mala Kurd de ti qezencek bo Kurd tune bûye û tunabe.

Lewma, di heyamê salên derbasbûyî de partî û aliyên Kurd hewl dane ku bi hemû awayî wan aloziyan çareser bikin û bi awayekê di nav sirûşta Kurdistanê de şerê birakujiyê nekin û derfetê nedin dijminê xaka Kurdistanê.

Her li ser vê bingehê di 6`ê Hezîrana 2023an de, li bajarê Bruksel a welatê Beljîkayê, partî û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê û neteweyên din yên Îranê li parlementoya Yekîtiya Ewrupayê, li ser hewcehiya hevbendiya di navbera aliyên siyasî ji bona serxistina şoreşa seranserî bi dijî dîktatoriya rejîma Îranê, li hev civiyan.

Di vê civîna pir alî de, tevahiya kesayetî û aliyên siyasî yên Kurd û neteweyên din yên Îranî yên pişkdar, li ser dijberiya bikom û bihev re li dijî rejîma dîktator a Îranê hev hizr bûn û îtraf bi şaştî û xemsariyên xwe di warê hizr û baweriya neteweyî û nebûna yekîtiyê kirin û îtraf bi vê yekê jî kirin ku hemû peymanname û lihevkirinên bi destê mezin hêzan û dagirkeran xeynî zirarê, ti qezencek bo Kurd û neteweyên din yên bindest yên Îranê re tune ye.

Mistefa Hicrî Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê got:

Siyaseta serkutkarî ya Komara Îslamî di heyamê derbasbûyî de bû sedem ku xelkê Îranê bi hemû cudahiyan ve li dora hev kom bibin û yek bigirin bo vê ku di yekem pêngavê de bo ruxandina rejîmê ku navê vê Komara Îslamî ye xebatê bikin û piştre ber bi çêkirina Îraneke nû ve pêngavan biavêjin.

Çend rojan berî civîna partî û aliyên Kurd li parlementoya Yekîtiya Ewrupayê, li bajarê Lozana Swîsrayê li rêkevta 27 û 28`ê Gulanê, civîna bi hilkevta sedsaliya peymannameya Lozanê bi beşdariya piraniya partî û kesayetiyên siyasî û rewşenbîrên kurd li her çar perçên Kurdistanê birêve çû.

Di wir de jî, partî û kesayetiyên siyasî yên Kurd îtraf bi şaştiyên xwe yên berê kirin ku, ti hêz an welatek xeynî Kurdan di xema Kurdan de nine û dibe bi hemû awayî Kurd pişta hev du bigrin û êdî şerê birakujî nekin.




Osman Baydemîr di vê konferansa sedsaliya peymannameya Lozanê de got: “Bi nêrîna min li Başûr, Rojhilat, Bakur û Rojavayê Kurdistanê di navbera Kurdan de ti pirsgirêk nemaye, lê pirsgirêk di navbera partiyan de hene. Eger partî guh bidin daxwaz û dengê Kurdan, bi dîtina min Kurd dê pêvajoya avakirina neteweyê temam bikin.”

Niha rewşa hey ya Rojhilata Navîn rewşek pir hestyar e û Kurd dibe pir hişyar û bi tedbîr tevbigere, da ku dîrokê dubare neke ji ber ku dagirker bi hemû awayî di her çar perçên Kurdistanê de hewl dide da ku dubare Kurdan berdin canê hev du.

Kurd dibe bi yekîtiya xwe bi hevxebatî û hevbendiya netewî ya xwe bikare hemî pîlangêrî û fitneyên dujmin û dagirkeran pûç bike û hem bi hev dengî û yekîtiya xwe bi pêngavên micid û rijd ber bi bidestve anîna daxwaziyên neteweyî yên xwe û serbestiya Kurdistanê ve pêngavan biavêje.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Binçavkirina bavê Sarîna Sa`idî Haşim Sa`idî ku yek ji qurbaniyên serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan, Azadî

Bavê "Sarîna Sa`idî" "Haşim Sa`idî" ku yek ji qurbaniyên serhildana şoreşgerî ya Jin, jiyan, Azadî ye, hê jî li girtîgeha Bokanê girtî ye.

Li gor gotina yek ji xizmên "Sa`idî", tevî dabînkirina barimteyê jî, dadgeh razî nebûye ku navbirî bi awayê demkî were berdan.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: "Haşim Sa`idî" di dema binçavkirinê de ji mafê hebûna parêzerê diyarkirî û serdana malbatê re jî bê par bûye.

Êvara roja Înê 19`ê Cozerdana sala 1402`an, "Haşim Sa`idî" tevî malbatên qurbaniyên Sine, Dêhgolan û Dîwandere, piştî merasima li ser gorên qurbaniyên serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya li Kurdistanê, li gosristana Ayçî a Seqizê û Bokanê, ji aliyê hêzên ewlehiyê ve li deriyê hundirîn yê bajarê Seqizê hatibû binçavkirin.

Di 5'ê Xezelwer a sala 1401'an de, Sarîna Sa`idî, 16 salî û zaroka Haşim, di kombûnên protestoyî yên roja 4'ê Xezelwer a sala 1401'an de, ji ber lêdana hêzên serkutkar û lêdana derba batûmê li serê wê, tûşî xwînrijiya mejî bibû û piştî ku rojekê li nexweşxaneyê de jiyana xwe ji dest da.

## Sine; Çalakvana kedkarî Hacer Saîdî piştî danîna barimteyê bi awayekî demkî hat berdan

Roja Yekşemî 28`ê Cozerdanê, "Hacer Seîdî", çalakvana kedkarî ya xelkê Sinê, bi danîna barimteya 500 milyon Tûmenî, bi awayekî demkî ji navenda çaksaziya vî bajarî hat azadkirin.

Êvariya roja Çarşemî 27`ê Banemer; ev xebatkara kedkaran tevî komek ji xebatkarên kedkariyê, ji bo bîranîna "Homan Ebdullahî" yek ji qurbaniyên serhildana şoreşa Jin, Jiyan, Azadî, serdana mala bavê wî kiribû. Hêzên ewlehiyê bi bê ku belgeya dadgehê nîşan bidin, avêtin ser mala "Ferşîd Ebdullahî" û bi tundî ew binçavkirin.

"Seîdî" ji bo jêpirsînê birin girtîgeha 'tla`ata Sinê û piştî bidawîhatina proseya lêpirsînê bo navenda çaksaziyê ya vî bajarî hatibû veguhastin.

Heya niha derbarê tohmetên li ser vê çalakvana kedkariyê, ti zanyariyên berfireh bi dest nin.

Di Tebaxa 2019an de, "Hacer Seîdî" bi tohmeta "endamtî di yek ji partiyên Kurd ên opozisyona hikûmeta Îranê de, beşdariya di karên neqanûnî de, ji aliyê taya 1 a Dadgeha Şoreşê ya Sinê bi serokatiya dadwer "Seîdî", bi têkliyên bi çalakvanên kedkariyê re" bi 5 sal heps tezîrî ji bo heyama çar salan hatibû cezarkirin.

## Sine; Welatiyekî Kurd bi danîna barimteyê hat berdan

Roja Yekşemî 28'ê Cozerdanê, welatiyê Kurd yê bi navê "Şoreş Mihemedpûr" kurê Haşim û xelkê gundê "Tengîsar"a ser bi bajarê Sinê, piştî danîna barimteyê ji girtîgehê hat azadkirin.

Ev welatiyê han di dema binçavkirinê de ji mafê hebûna parêzer re bê par bûye.

Roja Yekşemî 7`ê Cozerdanê, hêzên ewlehiyê ev welatiyê 36 salî bi bê nîşandan belgeya dadgehê, li cihê karê wî de ev binçavkirin û ji bo lêpirsînê bo girtîgeha Îdareya Îtila`ata Sinê veguhastibûn.

Heya niha derbarê sedema binçavkirin û tometbarkirina "Mihemedpûr" de ti zanyariyên berfireh nehatine bidest xistin.

## Di encama şopandina hêzên leşkerî de li herêmên sînorê Newûdê kolberek birîndar bû

Roja Yekşemî 27`ê Cozerdanê, kolberekî bi navê "Muxtar Kûyk" xelkê Merîwanê piştî ku ji aliyê hêzên leşkerî ve li navçeyên sînorî yên Newsûdê hatibû şopandin, ji bilindahiyê ketibû, û birîndar bû.

Di vê bûyerê de ev Kolberê han pişta wî bi giranî birîndar bûye û ji bo çareseriya pizîşkî rakirin nexweşxaneya bajarê Sinê.

Hat ragihandin ku rewşa giştî ya "Muxtar Kûyk" giran e.
Ev welatiyê Kurd 30'ê Tîrmeha 1401'an, li çarêya "Sale Abad" a bajarê Banê, bi bê nîşandana belgeya dadgehê ji aliyê îtla`ata Spaha Pasdaran ve hatibû binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha vê rêkxirawê li bajarê Sinê hatibû veguhastin.

Ribwar Talbî piştî lêpirsînê bo girtîgeha Bane hatibû veguhastin.

Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (448)

# Wêneyên karmendên Radyo Dengê Kurdistana Îranê









